hejmar 20 payîz 1996

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmancî

Min ev nivîsî ne ji bo sahibrewacan
Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

SIMBÊL

(t) Bıyık (f) Moustache (e) Moustache



simbêl**boq**

Rengên simbêlan

1- simbêlê **sor**
2- simbêlê **reş**
3- simbêlê **kizirî**
4- simbêlê **hennekirî**
5- simbêlê **kerteboz (qerteboz)**

Civîna Biskops Arnöyê ya 20emîn

Civîna 20emîn ya *Kurmancî* li Biskops Arnöyê (Swêdê) di navbera 13-20. 10. 1996an de çêbû. Di vê civînê de kesên beşdar li ser termên aborî, termên hiqûqî, devoka Qerejdaxê, îdyomên kurdî, cureyên simbêlan, ferhengoka *Roja Nû* û *Hawarê* xebitîn.

Di vê civînê de Mistefa Aydogan (Mêrdîn), Lutfî Baksî (Xerzan), Rojen Barnas (Diyarbekir), Abdullah Emîn Bêtasî (Behdînan), Salim Çeliker (Diyarbekir), Elîşêr (Wan), Rojan Hazim (Hekarî), Selam Nouman (Cizîrê), Mûsa Kaval (Hekarî), Hemîd Kiliçaslan (Mêrdîn), Mehmûd Lewendî (Qerejdax), Kendal Nezan (Diyarbekir), Zinar Soran (Dêrik), Behroz Sucaî (Şikak), Veysi Zeydanli (Bidlîs), Reşo Zîlan (Agirî) û Zeynelabîdîn Zinar (Batman) beşdar bûn.

Çend pirsên rastnivîsînê

Reşo ZÎLAN

Pirsa rastnivîsîna navên mirovan

Heçî pirsa rastnivîsîna navên mirovan e, ne bi tenê di zaravayê kurmancî, lê bi awayekî giştî di zimanê kurdî de, bi rastî jî, pirsgirêkeke mezin e. Mezinbûna pirsgirêkê ne bi tenê ji hebûna hinde zarava û devokên kurdî ye. Lê, berî her tiştî, ji tunebûna lêkolînên hûr û kûr yên fonolojîk (dengnasî) e, ku bi me nîşan bide ka li kû û dengên çilo hene. Hevpişkiya wan li kîjan deveran û di navbera kîjan zarava û devokan de hene. Ka guhirîna hin dengan çawan pêşde tên û herweha bandora dengên hin zimanên biyanî û cînar yên li ser zimanê me çi ne û hwd. Di gel vê yekê, nivîsîna kurdî bi çend alfabeyên têvel jî welê dike ku astengên heyî hê mezintir bibin. Zaravayên kurdî yên ku ketine nivîsarê jî, ji danîna hin normên zelalkirî bê par in. Ji lewra jî her kesek li gor kêfa xwe, a rastî jî li gor zimanê ku wî xwe pê kiriye xwande û bi xurtî ketiye bin bandor û tesîra wî, riyeke rastnivîsînê daye ber xwe.

Em ê di vê nivîsarê de zêde li ser pirsên dengan ranewestin. Lê, hewce ye ku em bi kêmanî piçekî li ser pirsa alfabeyên ku kurdî pê têne nivîsîn, rawestin. Ew alfabe jî, sê alfabe ne; *kîrîlî, 'erebî* û *latînî.*

Ji van, heçî alfabeya kîrîlî ye, êdî ber bi mirinê diçe. Nema wek berê tête bi kar anîn. Lê bê guman edebiyateke dewlemend ya zaravayê kurmancî pê hatiye nivîsîn. Piştî nemana Sovyetistanê, ew hêdî hêdî ji meydana nivîsînê winda bû. Cihê xwe ji alfabeya latînî re hişt. Dîsan jî, ji ber ku edebiyata ku bi kîrîlî derdiket, hema hema qet dernediket derveyê Sovyetistanê, ku bêtir piştî salên 1970yî giha destên Kurdên derveyê Sovyetistanê, rê û awayên rastnivîsîna wê çu bandor û tesîr li ser kurdiya bi tîpên latînî û 'erebî nekir. Rê û awayên rastnivîsîna wê, ku ketibû bin bandora rê û awayên rastinivîsîna zimanê rûsî, her di nav Kurdên Sovyetistanê de bi kar hat. Ji xwe ne mumkun bû ku ew bibe alfabeyeke giştî ji bo hemû Kurdan û bi vî rengî ji aliyê wan ve jî

bête bi kar anîn. Ji lewra jî, di warê rastnivîsîna navên mirovan de, tiştekî ku mirov tê de wek sûdbexş bibîne, tune ye. Di vî warî de, pirsên ku ew tîne pêş her eynî pirsgirêk in, ku ji aliyê taybetmendiya xwe ve, di nivîsîna alfabeya 'erebî de hene. Ji ber vê yekê jî, em ê her yekser dest biavêjin alfabeya 'erebî û pir bi kurtî li wan hûr bibin. Çi ne ev taybetmendî? Berî her tiştî, divê em bidin zanîn, ku sîstema alfabeya kîrîlîk û nivîsîn û rastnivîsîna wê û ya 'erebî, ji hev dûr in. Lê, bi tenê di warê rastnivîsîna navên mirovan de (herweha navên coxrafîk û hwd jî) hevpişkiyeke mezin di navbera herdû alfabeyan de heye. Ango di herdukan de jî nav li gor bilêvkirinê, ne ku li gor orjînalê têne nivîsîn. Hindek caran, ji ber tunebûna dengekî di wî zimanî de, bo nimûne dengê «H»yê di zimanê rûsî de û dengên wek Ç, F, G, J, P, V û hin dengdarên din di zimanê 'erebî de, dibe sedemê ku navên hinde mirovan bi rengekî din bête bi lêv kirin. Bê guman, alfabeyên modifîyekirî yên kurdiya kîrîlî û 'erebî, ji bo van dengan tîpên xweser danîne. Tevî vê jî, gelek caran navên bi riya van zimanan ketine nivîsîna kurdî ya bi alfabeyên kîrîlî û 'erebî, her wek xwe mane û li gor bilêvkirina xwe ya kurdî nehatine guhartin û nivîsîn.

Bi taybetî jî zimanê 'erebî hem bi riya dîn û hem jî bi riya alfabeyê gelek navên 'erebî, ku di nav Kurdan de mişe ne, wisan ku navên 'Ereb bi xwe li xwe nakin xistine nav Kurdan û di nav Kurdan de bûne navên birewac û normal. Herweha bi vê riyê dengên ne kurdî jî, yên ji kurdî re pir xerîb in, ketine zimanê kurdî û nivîsîna wê.

Baş e, gelo em Kurd di gel hinde dijwariyên heyî, pirsa rastnivîsîna navan çawan çareser bikin ? Bi a me, du rê hene li ber me. Ya yekê ew e, ku hema em bibêjin bila hemû li gor bilêvkirina kurdî bêne nivîsîn. Bêî ku em guh bidin orjînala wan. Heye ku ev rê ji bo gelek kesan cazibedar be û herweha kurdîkirina (kurdîfîzekirin) wan paqijî, zelalî, rewanî û rehetiyek be. Lê bê guman ev karekî zehf aloz û tevlihev e, ku heke mirov vê riyê bide ber xwe, ji bin derketina hin barên ku ev rê bi xwe re tîne û dike nivîsara kurdî, ne gengaz e. Ji bilî vê yekê, ev dê bibe sebeba îzolekirina ziman û herwisan xwe li derveyê pêşdeçûnên piralî hîştinê. Riya didwan jî ew e, ku dan ser riya navneteweyî û li gor rê û normên navneteweyî yên hevpişk pêkanîna rastinvîsîna navan e. Bi a me, dê rêçeke weha rê ji ziman re xweş bike da ku ew di qalibeke neteweyî de îzole nemîne û rê li ber hin tengbîniyan jî bigire.

Vêca pêdivî ye ku bête gotin, di warê nivîsîna navên mirovan de çend rê û normên navneteweyî yên hevpişk hene, ku zimanên tîpên latînî bi kar tînin ew ji rastinvîsa xwe re wek destûr danîne. Ew jî bi kurtî ev in: Zimanên ku alfabeya latînî bi kar tînin, navên ku bi alfabeya latînî hatine nivîsîn, weke ku ketine nivîsînê dinivîsin. Sadiqî orjînala wan dimînin. Eger di alfabeya wan de hin tîp tune bin jî, yan tîpa ku ji aliyê wêneya xwe ve herî nêzîk e yan jî tîpa ku ji bo dengê nêzîki wî hatiye danîn, bi kar tînin. Bo nimûne : Di gelek zimanan de tîpên «ö, ø, ä, å , æ, ë, ê, é, û, î, ş» û hwd tune ne. Ew di şûna wan de, tîpên ku nêzikî wêneyên wan in, wek «o, o, a, a, e, e, u, i, s» dinivîsin. Yan jî, ji bo dengê «ö»yê, «oe», ji bo dengê «ä» û «æ»yê, «ae» ji bo dengê «ü»yê, «ue» bi kar tînin. Li gor vê, divê em di nivîsarên kurdî yên bi tîpên latînî de navên wek: Izetbegovič —> Izetbegovic, Miša —> Misa, Åsa —> Asa, Göta —> Gota (Goeta) û Müller —> Muller (Mueller) binivîsin.

Herwek me got, divê em jî, di pirsa rastnivîsîna navên bi alfabeya latînî de sadiqî orjînala wan bimînin. Lê helbet ji bo rehetiyê di nav dukevanekê de bilêvkirina wan jî binivîsin. Bi vî rengî, navên ku ji aliyê nivîsînê ve gelekî çetin in, dikarin bi hêsanî bêne bi lêv kirin.

Dibe ku ev di destpêkê de gelekî zehmet bête xuya kirin. Lê, nemaze di vê dewranê de, dewrana ku teknolojiyê serê xwe hildaye û bi çargavî berê xwe daye deşt û rastên dawîtuneyî, divê em Kurd jî bizanibin ku ziman di çarçoveyeke teng de hew tête zîndan kirin. Divê em jî wek miletên din fêrî nivîsîn û xwandina navên biyanî bibin. Bizanibin ku guhirîna bi tenê tîpekê me tûşî sergêjiyên çendî mezin dikin. Bo nimûne: Navê -Corc-yê ewropî bi çend awayan tête nivîsîn; **George, Georges, Georg, Gorge.** Di qeyd, katalog, kompiyûter û fêhrist û hwd de li navê -Corc- gerîn û ew bi rehetî dîtin ne gengaz e, ku heke ew nav, nemaze orîjînala wî, weha bi çend awayên curbicur hatibe nivîsîn. Ev pirsa han ne bi tenê ji bo navên ewropî, lê ji bo hinde zimanên din jî hene. Di gel vê jî, hinde nav jî hene ku her weke nivîsandî têne bi lêv kirin.

Çend nimûne: George Bush (Corc Bûş), Richard Nixon (Rîçird Nîkson), Tom Jones (Tom Cons), Bill Cosby (Bîl Kosbî), Vaclav Havel (Vaklav Havil), Kofi Annan (Kofî Annan), Theodore Pangalos (Teodor Pangalos), Netanyahu (Netanyahû), Kengo Wa Dondo (Kengo Wa Dongo), Franz Vranitzky (Frantz Vranîtzkî), Roger Lescot (Rojê Lesko), Viollette (Vîyolêt), Berisha (Berîşa), Le Pen (Lö Pen).

Me divê em li vir bi têbîniyeke piçûk behs bikin, ku hinde nav hene ew di her zimanekî de bi rengekî têne nivîsîn û lê her zimanek jî wê li gor fonetîka xwe bi lêv dike.

Wek: Mayk (Mayk), Mike (Mayk), Mike (Mîk), Micke (Mîke), Mike (Mîke) û hwd.

Lê heçî navên ku ne bi latîni hatibin nivîsîn e, divê em jî li gor transkrîbsiyona wan ya navneteweyî binivîsin. Helbet gelek caran demûdezgehên wî welatî bi xwe li ser transkrîbsiyona navan, ku wê jî bi riya biryara zimannasên xwe û saziyên jê berpirsiyar, bi xelqê didin zanîn. Bo nimûne, Çînê berî çendsalekê norm û sîstema nû ya transkrîbsiyona navên çînî da daxuyanî kirin û got, ku ev cure transkrîbsiyona nû ya bi latînî nêzîktirê bilêvkirina orjînalê ye. Me divê hûn navên me yên çînî watov binivîsin. Welê jî bû. Êdî xelqê jî bi a wan kir û navên çînî li gor sîstema resmî ya transkrîbsiyona çînî nivîsandin. Jê çend nimûne: Deng Xiaoping (Deng Ksîyaopîng), Chang Kai-shek (Çîyang Kay-şek).

Ji aliyekî din ve, navên ji alfabeya kîrîlî, divê li gor bilêvkirina kurdî bên nivîsîn.

Wek: Nîkîta Xrûşov, Gorbaçov, Yêltsîn, Maksîm Gorkî, Aleksandir Lebed, Pûşkîn, Mayakovskî û hwd.

Heçî ji bo navên bi zimanê erebî ne, 'Ereb bi xwe negihane biryarekê. Navên 'erebî, di xebatên zanistî de, wek her zimanekî rojhilatê, bi alfabeya traskrîbsiyona zimanên rojhilatî dinivîsin. Lê di navnivîsîn û qeydan de, yan li gor alfabeya fransî yan jî ya îngilîzî dinivîsin. Welatên 'erebî yên ku ketibûn bin destên Îngilîzan, li ser transkrîbsiyona îngilizî, yên ku ketibûn bin destên Fransîyan, li ser transkrîbsiyona fransî dimeşin. Bo nimûne: Eger navê camêrekî Şukrî be û eger ew ji Sûriyê yan jî ji Cezayirê be, navê wî wek «Choukri/Choukry», na eger ji Îraqê yan jî ji Misrê be, navê wî wek «Shoukry/Shoukri/Shokry/Shokri» dinivîsin. Ji bilî vê, tevî ku 'ereb bi xwe navên xwe bi tîpên 'erebî bi rengên curbicur dinivîsin, her miletek jî wê li gor bilêvkirin û rastnivîsîna xwe dinivîse. Wek navê Mihemed, ku bi van çend awayan li qelemê didin: Mohamed, Mohammed, Mohamad, Mohammad, Muhammed, Mehmet.

Gelo em Kurd bi çi awayî binivisin? Divê em, çi navên 'erebî bin û çi jî yên farisî bin, ango navên ku traskribe dibin, li gor alfabeya kurdî binivîsin. Heçî navên ku 'erebî yan jî farisî ne, lê Kurd jî li xwe dikin û bi kar tînin, divê em wan li gor bilêvkirina kurdî binivîsin.

Ji bo têkneçûna zimanê me divê em bi xurtî hewl bidin ku nekevin bin bandor û tesîra zimanê neteweyên serdest û navan li gor rastivîsîn û bilêvkirina wan nenivîsin. Pêwist e em li vir bibêjin, ku Kurdên bakur di vî warî de nimûneyeke helez radixin ber çavan. Ew, di nivîsarên xwe yên kurdî de, navên wek Xumeynî, Mehmûd, Ferhad, Ehmed, Evdilezîz, Siltan, Belqîz, Zeyneb, û hwd, wek Humeynî, Mahmût/Mehmût, Ferhat, Ahmet/Ehmet, Abdulazîz/Ebdulazîz, Sûltan/Sultan, Belkiz, Zeynep dinivîsin. Ji bo kesên ku tirkî nizanin, pêdivî ye ku mirov şerh bike, ku di zimanê tirkî de, gotinên tirkî di halê xwe yê netewandî de, ji bilî hin awarteyan, divê çu caran bi bêdengên nerm dawî nehên. Ji ber hindê jî Tirk li gor destûra zimanê xwe nikarin bibêjin Ferhad, Zeyneb û hwd. Ji ber ku «D» û «B» ji bêdengên dengên nerm in. Divê ji dêlva wan bêdengên «T» û «P»yê bi kar bînin û bibêjin Ferhat û Zeynep...

Lê kurdî çi şol pê ye ! Divê kurdî li ser destûra zimanê xwe here, ne ya zimanekî din. Ew nav çawan li gor fonetîka kurdî dihêne bi lêv kirin wisan jî bihêne nivîsîn. Ji lewra, di warê rastinvîsîna navên ji zimanê 'erebî ketine kurdî de, me divê em çend nimûneyan berpêş bikin. Navên ku bi gotina «Abd-»ê dest pê dikin, divê wek «Evd-» bêne nivîsîn. Wek: Evdal. Navên ku tê de veqetandeka «-el-, -ul-, -us-,...» hene, divê li gor navan bi xwe yan wek «-il-» yan jî her «-ul-» bêne nivîsîn. Wek: Evdilmitelib, vdilrehman, Evdilsemed, Evdilmecid, Evdilmelîk, Evdilqadir, Evdilxaliq, Evdilxenî, Evdilkerîm, Evdilcebar. Navên ku bi gotina «-lah» dawî tên, divê li gor navan yan wek «-le» yan jî «-la» bêne nivîsîn. Wek:, Kerîmulla, Se'dulla, Evdille û hwd. Navên din jî her li gor bilêvkirina kurdî, wek: Silêman, Ûsiv, Cebar, Setar, Kamil, Feysel, Xalid, Xelîl, Xidir, Kerîm û hwd. Ji bo bilêvkirineke rast ya navên ku tê de dengê «'eyn» hene, mirov dikare vê nîşana han « ' » bi kar bîne.
Wek: «'Îsa, 'Emer, 'Umran, 'Isam, Si'ûd, 'Arif, Ne'man û hwd«.

Herweha divê navên farisî jî li gor alfabeya kurdî bên nivîsîn. Ev jî çend nimûne ne ji navên farisî: Xeyam, Firdewsî, Elî Ekber Vêlayetî, Xamêneî, Xelxalî, Jîla, Hesen Ebbasnejad, Fêreydûn Xosrozadê, Ferîborz Tebatebaîyan, Sîmîn Şahîndost, Jalê, Ehmed Şamlû, Qasimlû, Hesenpûr.

Îdyomên kurdî

(II)

Amadekar : Mustafa AYDOGAN
Hemîd KILIÇASLAN

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
agir berra nav wan da: agir berda nav wan, agir xist nav wan; ew berdan hev	aralarına fitne fesat soktu, başlarını belaya soktu	il a semé la discorde, l'animosité entre eux	he makes mischief (stirs up trouble) between them
a (ya) wî lê hat: kêsa wî lê hatiye	eline fırsat geçti: şansı yaver gitti	la chance lui a sourit; il a eu de la veine	he was in luck, good luck (good fortune) smiled on him
agir bi erdê xistin: fesadî belav kirin;	fitne fesat yaratmak; birbirine düşürmek	semer la discorde	make mischief, stir up trouble
aş betal kirin	faaliyete son vermek	cesser ses activités	to retire, to cease working
av di navbera wan de naçe	aralarından su sızmıyor	ils sont comme cul et chemise	they are hank in glove,
av reşand gunê wî: ***1) vala vegerandin, 2) rê li ber biserketinê girtin***	1) eli boş çevirmek 2) başarısına engel olmak	1) renvoyer quelqu'un bre-douille, les mains vides, 2) faire échouer être fichu, être perdu,	1) to send someone away empty handed 2) to fail, to be lost, lost without trace
av û av çûn	umulmaz bir şekilde yok olmak	disparaître sans laisser de trace	
ava aşekî ji dev çûn; ava heft şorbeyan ji dev çûn:	taacüp etmek, ağzının suyu akmak	être ébahi, baver d'étonnement	to be breathless, gqping with astonishment

pir ecêbmayî man			
ava buhurekî	aynı tarağın bezi	du même accabit, du même bord	the same type, same side
ava serî germ kirin	başının suyunu ısıtmak, ölümünü hazırlamak	comploter la perte ou la mort de quelqu'un	plot against someone, plot someone's death
avî: xerîb	ecnebi, yabancı	étranger	foreigner
avî çûn, hawî çûn, ava wan bi cokekê	kayb olmak	se perdre, s'égarer	to get lost
de naçe: li hevdu nakin	anlaşamıyorlar	ils ne peuvent pas se sentir	they can't stand one another
axê (derzîyê) biavêjî li erdê nakeve: pir qelebalix e	iğne atsan yere düşmez; çok kalabalık	foule très dense (où une aiguille ne pourrait toucher terre)	a dense crowd
avêtin paş guhê xwe	kulak ardı etmek	faire la sourde oreille, négliger	turn a deaf ear, neglect,
ba bi ber guh ketin	kulağına kar suyu kaçmak, sezmek	avoir vent de quelque chause.	to have wind of something
ba ji ber çûn: perça wî danîn	yatışmak, sakinleşmek	s'apaiser, décolérer	to calm down, cool down
ba ji te baran ji te	kendi önerip kendi cayan	qui propose et qui change d'avis	someone who blows hot and cold
ba bi ber ketin	hava kaçımak, yellenmek	lâcher des vents, péter	to break wind, to fart
barê xwe li tajiyê kirin	sermayeyi kediye yüklemek, iflas etmek	faire faillite	to go bankrupt,
barê êzingê min	Nuh deyip peygamber demeyen, inatçı	têtu, tête de bois	stubborn, mule headed
baskê wî sist bûn; tengê wî sist bûn	yelkenleri suya indirmek	rabattre ses prétentions	toclimb down, to knuckle under
basko kirin	kolunu kanadını kırmak, güçsüzleştirmek	couper les ailes de quelqu'un, quelqu'un à l'impuissance	hamstring someone
basko nekirin	fütursüz yalan söylemek, desteksiz atmak	mentir sans vergogne	to lie shamelessly
bav ji hev re çêkirin, bavê hev anîn pêş çavê hev	birbirini rezil etmek	s'entre déchirer, se couvrir mutuellement de honte	sling mud (or abuse) at one another
bavê hev şewitandin: hevdu perîşan kirin	anasını ağlatmak	se déchirer, s'entre-déchirer	to tear one another to pieces
bayê sor pê ketin	eli ayağı tutulmak	avoir pieds et poings liés; êtreto immobilisé par le rhumatisme	be tied hands and feet, to be bed-ridden with rhuma tism
bayê wî bilind e	havalıdır, fiyakalıdır	il a grand air, il a la superbe	high and might, haughty
bayê wî rabûye	işleri yolunda	il a le vent en poupe	has the wind in his sails
bayek ji ber serê xwe berdan	tebdili hava etmek	changer d'air	change of air
bê nan û xwê: bê wefa	vefasız	infidèle, déloyal	unfaithful, disloyal
bê serberate çûn; bê ser û bê	iz bırakmadan	partir sans laisser de	to leave will leaving
berat çûn; bê ser û şûn çûn	kaybolmak	traces; disparaître	an address, to disappear
bê xwê bûn; bê tam bûn	tatsız olmak, münasebetsiz olmak	être désagréable, inconvenant	to be disgreable, unsuitable
bê zirav	ödlek, korkak	lâche, poltron	coward
bê dil	gönülsüz	involontaire	unwilling, unintentional
belika guhê wî xwê nade	tınmıyor	ile ne réagit pas; il subit sans réagir	he does not react
(ji yekî re) bêmal bûn	varını yoğunu biri için feda etmeye hazır olmak	être prêt à se sacrifier corps et âme pour quelqu'un	submits to be ready to sacrifice oneself body and soul for someone
ben bi lingan neketiye; bê hevsar	kuralsız; ipe sapa gelmez	sans foi ni loi	lawless and faithless
bengî	kara sevdalı, mecnun	amoureux fou, passioné	madly in love
bencxwarî	deli, çılgın	fou	mad
benê (benikê) dû şûjinê, benikê dû hebanê: dûvik	birine ya da bir gruba uyan, tabi olan	qui suit quelqu'un ou un groupe, qui s'adapte aux autres	sameone who follows or adapts himself to a group or to others
benê wî ragirtin, hevsarê wî kişandin	dizginini tutmak, kontrolü elden bırakmamak	le tenir en laisse, le contrôler	hold in leash
benik di guhê wî de rakirin	umut vererek oyalamak	tromper en donnant à espérer pour gagner du temps	to deceive by letting the other hope in vain so as to gain time
bûn benîştê devê xelkê, qajikê ser devê xelkê, ketin ser zar û zimanan	dile düşmek	devenir l'objet de potins	to be subject of gossip

benîştê xwe lê nedanîn	önemsememek	ne pas accorder de l'importance	to attach no importance
benîştê xwe li awakî cûtin	bildiğini okumak, başkalarını umursamamak	en faire à sa tête	to do whatever he/she wants
beqa dixesîne, kêça dixesîne, sa xwê dike	kaldırım mühendisi, boş gezenlerin baş kalfası	fainéant, tire-au-flanc	loafer, idler
berdasa xwe fire kirin	büyük işlere kalkmak, girişmek	entreprendre de grandes actions, étendre son champ d'action	undertake major operations widen his field of action
(wek) berê li nav heriyê dayî, wek gula bihelînî kêb	(söz için) lop diye yerine oturmuş	(parole) qui fait mouche	hits the nail on the head
bergiya devê xwe nezanîn	patavatsız olmak, ne dediğini bilmemek	être impertinent; tenir des propos inconsidérés	cheeky, to express irresponsible ideas
berxê ber gelek maka; çaralîxur (çaralîxwer)	oportünist, ilkesiz, çıkarcı, her tarafta çıkar arayan	opportuniste, qui mange à tous les rateliers	opportunist plays both ends against the middle
bêtarê wî di xizna wî de be ; bela wî li ber derê wî be, bela wî jê re be	belası kendisine kalsın kimseye bulaşmasın	que sa colère, sa nuisance l'emporte lui-même	carred away by his anger
bêtar	müsibet, bela	calamité, desastre	disaster, calamity
bêvil hatin, kirr hatin, kirr rabûn, kurm hatin kurmê cixarê hate wî	kurtlanmak, canı sigara içmek istiyor	avoir envie de; céder à une envie ou à une habitude il a une forte envie de fumer	give way to (a habit, a desire) he has a strong urge to smoke
bêvila (pozê) xwe daleqandin; bêvila xwe kirin	alınmak	s'offusquer	to take offense
bêvil neşewitîn	utanmamak,sıkılmamak	ne pas avoir honte, être effronté, être sans gêne	be shameless inflict a punishment
bêvila yekî firikandin, gemirandin, mizdan	burnunu sürtmek, dersini vermek, haddini bildirmek	infliger une punition, humilier	humiliate
bêvilbilind, kepîbilind, pozbilind, difinbilind, difinqilû, lûtberz	burnu havada, kibirli	hautain	haughty, nose-in the air, conceited
bi agirê yekî şewitîn; di agirê yekî de şewitîn (sotin)	ateşine yanmak	subir un préjudice à cause de quelq'un d'autre	to suffer damages or harm because of someone else


Ferhengoka *Roja Nû*
(II)

Amadekar : Hemîd KILIÇASLAN

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
adinê rojê: roja din	ertesi gün	lendemain	the day after
arsimî, bahorî, bapêşî,	nezle	enrhumé persîvî	to have a cold
avdak, hevdeyek, tayek	tel (saç teli)	cheveu	hair
axpîne; turabêlk, tirabêlk	ufalanmış toprak,	limon	alluvium
bafûr	tiryak		
bedenparêzî	bedeneğitimi	éducation physique	physical training
bêkêr	işe yaramaz	vaurien	good for nothing, rascal
berger, *n.m.*	yalvarma, yakarma	supplication, prière	prayer
berger, *n.*	vasi, aracı, bakıcı	héritier, intermédiaire	heir
bergor, alîgor	kıble duvarının oyu-arak ölünün defne-dildiği mezar türü	tombe musulmane où le mort est placé dans une cavité pra-tiquée dans le mur tourné vers la Mecque	Moslem tomb inhere the body is placed in a cavity dug into a wall turned towards Mecca
betar; bêtar	afet, musibet	désastre, calamité	calamity, disaster
bîna	gören	qui voit, voyant	sighted person

nebîn, kor, nebîna	görmeyen, kör	non voyant	blind, unsighted
nepenîn	saklamak, gizlemek	dissimuler, cacher	to hide, to conceal
nepenî	gizli, görünmeyen, saklı	secret, dissimulé, invisible	hidden, secret, invisible
nimandin	temsil etmek, göstermek	représenter	to represent
bizdonek	korkak, ödlek	poltron, peureux, froussard	coward, fearful
çilpandin	çırpmak, çalmak	chaparder, voler	to pinch, to steal
çarçik	kare	carré	square
çavteng	cimri, hasud	avare, envieux	miser
çêrî; çêlî	yavru	petit, enfant	the young (of an animal or bird), child
çeng bûn	fırlamak	1) bondir, 2) se précipter	1) to fly out, to leap out, 2) to rush
çepel	kötü, iğrenç, rezil	infâme, odieux, vil, dégoûtant	disgusting, vile, infamous
çîçik; çûk, çivîk, çûçik	kuş	oiseau	bird
çito; çawan, çilo, çere, çitil	nasıl	comment	how
dêmanî	yerleşik	sédentaire	sedentery, settled
derûd, derhûd	kefil	garanteur, caution	garantor
bi dest û lepan şer kirin	silahsız, tekme tokat kavga etmek	en venir aux mains	
destvala	eliboş	à mains vides	empty-handed
han, hawar	imdat	appel, secours	help, aid
hatin hana an hawara yekî	birinin imdadına gelmek	venir au secours de quelqu'un	to come to the help (assitance) (of)
duryan	kavşak, yol ayırımı	carrefour	crossroads
gî, gişt, hemî, hemû	hepsi, tümü	tout, tous, totalité	all, the whole
henzel: *petîşok*	Ebu Cehil karpuzu	variété de pastèque sauvage amère	wild and bitter water melon
hêvişandin	esirgemek, tasaruf etmek	épargner	to save, to spare
hilgivîn	kaldırmak, yükseltmek	soulever	to lift
hûtin: hewtin	havlama	aboiement	bark
manegî	soylu at	cheval pur sang	thorough breed
mirêkar; minêkar	arzulu, istekli	désireux, aspirant	eager, desirous, longing
pêçek, qumatk	kundak	lange	nappy
pelasekî kerkît	el tezgahında dokunmuş kilim	tapi tissé avec un métier manuel	hand woven carpet
pêmende	yoksun	privé, depourvu	deprived
pevçûn	kavga	querelle, bagarre	quarrel, fight
qelûnbesk, sibîl, qelûn	pipo	pipe	pipe
qulix	nöbetçi	gardien, veilleur	watchman, guard
rageşî	hırçınlık		
serhişkî	kalınkafalılık	entêtement	stubbornness
sipîsax	sapasağlam	robuste, en bonne santé	in good health robust
sîsik, dendik	çekirdek	noyau	nucleus, kernel (of a nut)
solbend, nalbend	nalbant	maréchal-ferrant	blacksmith
şihîn, mêzin	terazi	balance	scales
tejber	mefruşat	meuble	furniture
tertepêl	doktor muayenesi	auscultation	auscultation
veniştin	tünemek	se percher	to perch
veparimandin	titremek, silkelenmek	frissonner, frémir	to quake, to shudder, shiver
zaye	(onların) ürünleri	produit, progéniture	offspring



simbêl**palik**


simbêl**qeytan**



simbêl**tûj**


simbêl**badayî**



simbêl**mûç**, simbêl**pîv**, simbêl**mişk**



simbêl**şor**



simbêl**pîj**


simbêl**beran**



simbêl**gustîl**, simbêl**xelek**



simbêl**qelem**



simbêl**xiştik**


simbêl**nivişt**



simbêl**tapan**


simbêl**bor**


simbêl**sivnik**, simbêl**gêzî**


simbêl**gergerî**


simbêl**zeytûnî**


simbêl**jûjî**

Termên aborî

(II)

Amadekar : Salim ÇELIKER

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
mezinbûn	büyüme	croissance	growth
lez	hız, sürat	vitesse	speed
leza mezinbûnê	büyüme hızı	vitesse de croissace	speed of growth
nisbet	oran	taux	rate
nisbeta mezinbûnê	büyüme oranı	taux de croissance	rate of growth
belavkirin	dağıtım	distribution	distribution
hatinî, hatin	gelir	revenue	income
hatiniya kêm	dar gelir	faible revenue	low income
hatiniya bilind	yüksek gelir	haut revenue	high income
guhêrbar	değişken	variable	variable
teraz	denge	équilibre	balance
bi teraz	dengeli	équilibré	balanced
bê teraz	dengesiz	déséquilibré	unbalanced
butçeya biteraz	denk bütçe	budget équilibré	balanced budget
terazname	bilanço	bilan	balance sheet, assessment
dewletgîrî	devletçilik	étatisme	statism
dewletgîr	develtçi	étatiste	statist, partisan of state control
Rêxistina Plankirinê ya Dewletê	Devlet Planlama Teşkilatı	Commissariat national du Plan	State Planing Organisation
gerr	dolaşım	circulation	circulation
gerra xwînê	kan dolaşımı	circulation sanguine	circulation of the blood
gerra mal	mal, eşya dolaşımı	ciculation des marchandises	circulation of the goods
bacên yekser	dolaysız vergiler	impôts directs	direct taxes
bacên neyekser	dolaylı vergiler	impôts indirects	indirect taxes
rawestîn	durgunluk	stagnation	stagnation
rawestîna aborî	ekonomik durgunluk	stagnation économique	economic stagnation
siyaseta aborî	ekonomi politikası	politique économique	economic policy
aborînas	iktisatçı	écnonomiste	economist
kar	1) iş, 2) kazanc, kar	1) travail, occupation, 2) profit, bénéfice,	1) work, labour, job, 2) profit, benefit
karker	işçi	ouvrier	worker, workman
kardar	çalışan	qui a un emploi, salarié	employed worker
karmend	memur	employé, fonctionnaire	employee, civil servant
karbidest	yönetici	dirigeant	official, ruler, leader
kardêr	işveren	employeur	employer
xebitandin	çalıştırmak, işletmek	employer, faire travailer	to employ
xebitandin	çalıştırma, işletme	action d'employer, emploi	employment

Devoka Qerejdaxê

(IV)

Amadekar : Mahmûd LEWENDÎ

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
kem	kısa, kesik	court, coupé, tronqué, amputé	short, cut, truncated, amputated
Ez poz jêkim kemo ye, ez guh jêkim kerro ye, bêar bêarê herro ye			
kem kirin	kısaltmak, (saç, tüy v.s. gibi şeyleri) kesmek	écourter, racourcir, tronquer, amputer	to shorter, to truncate, to amputate
kerrax, çırpan	tarla, bağ ve bostan sulamada su tevziatçısı	personne chargée de la répartition de l'eau dans l'agriculture et l'horticulture	person responsable for distribution of irrigation
kerdî, kertik	ark, evlek,ya da karığın sırt kısmı	bordure d'une rigole d'irrigation	bank of an irrigation channel
kerge, kergan	1) üzüm kaynatma kazanı, 2) bağ bozumu dibeği	1) grand chaudron utilisé pour faire bouillir le jus de raisin, 2) grand mortier de vendange pour presser le raisin	1) cauldron for boiling grape juice 2) vine press
kerkere	iriyarı, iriyarı kimse	corpulent, massif, armoire à glace	corpulent, big-bodied, stocky
kerme, dirg	ahırlarda kurumuş gübre, kesek	engrais animal formé dans l'étable	manure
kerkon	eski kıl çadır parçası	pièce d'étoffe de tente en poils	
kertal	kurumuş kenger	chardon seché	dried thistle
keramper: kerengper:	kurumuş diken		
stirî û qirş û qalên hişk			
kerempero bi kû de ? Ba bi kû de bibe !			
keskûsor, keskesor, heftreng	gök kuşağı	arc-en-ciel	rainbow
keşîş, keşe, qeşe	papaz	prêtre	priest
reben	rahib	moine	monk
metran	piskopos	évêque	bishop
kevn û kot; kerkot	kırık dökük, eski püskü	vieillerie, antiquaille, friperie	second hand objects or clothes
kewaşe, kewî	kurumuş ot, dal, çalı çırpı gibi şeyler	brindilles sèches	dry sticks, thorns, or twigs
kewişandin	budamak	tailler, émonder	to trim, to prune
kêlik, kêl	mezar taşı	pierre tombale	tomb stone
kêrt, kart	25 kuruş değerindeki para birimi	pièce de monnaie turque de 25 kurus; quart de livre	Turkish 25 kurus coin, quarter of a lira

kêsrek, kêsek, kêstig, kêstil, kestek, guntil, şel	kesek	motte de terre	clod, lump of earth
kêş, nm	serkeş, külhan beyi	voyou, racaille, canaille	rowdy, bully
kêş, nf.	kuyruk, ard arda sıraya girme	queue (en file indienne)	queue
kidê kidê, gidê gidê	oğlağa seslenirken kullanılan sözcük	locution utilisée pour s'adresser aux agneaux	expression used for calling or adressing lambs
kidik: karikê biçûk	yeni doğmuş oğlak	l'agneau qui veint de naître	new-born lamb
kijole; qirş, qirjik	kirişlerin üzerine serilen çalı çırpı gibi şeyler	brindilles étalées sur les poutrelles pour couvrir le toit de maisons traditionnelles	twigs placed over roof beams for thatching a house
kilandin	yayık yaymak	baratter	to churcn (milk)
kil, *nm*	sürme	khol, hohol	kohl
kil kirin, kil dan, **kil kişandin**	sürme çekmek	mettre du khol autour des yeux	putting kohl round the eyes
kil, *nm*	sallama	action de balancer	swinging
kil kirin, kil dan	sallamak	balancer, secouer	to swing, to shake
kiraşo	çamaşırcı	blanchisseuse	washerwoman
kirênek, kikirk, kirkirîk, kirtik	kıkırdak	cartillage	cartillage, gristle
kirifandin	kıtır kıtır yemek	croquer	to crunch, to eat with a crackling noise
kitanbelaş, belaş, malbelaş	keten bezi	tissu en lin grossier	rough linen cloth
kivil	hayvan postu	peau d'animal	undressed skin
kix	(çocuk dilinde) pis, kötü şey, kaka	(dans le language enfantin) vilain,sale, mauvais	nasty, dirty (child talk)
kixs, kixsik	soğan arpacığı	échalotte	shallot, sping onion
kiz	yanık yün kokusu	odeur de laine brûlée	smell of burnt wool
kizin	burçak	cesse	common vetch
kizirandin	1) tütsülemek alazlamak, 2) ka-zandibi olmak, tencere dibinin tutuşması	1) flamber (une volaille), brûler (poils, cheveux) 2) attacher, coller (pour une marmite)	1) singe (feathers or hair), 2) stuck (to bottom of cooking pot)
koçek	köçek, iyi oynayan	danseur	dancer
kodik	ağaç yada topraktan yapılmış kab	écuelle, en sébile, bol en bois ou terre cuite	porringer, wooden bowl
kodika parsê	dilenci çanağı	sébile du mendiant	begars' alms bowl
kodika şivanan	çoban çanağı	écuelle du berger	shepherd's bowl
kîp kirin	kenetlemek, oturtmak yerleştirmek	cramponner, lier fortement	to cling tightly, to bild tightly
kokim	kocamış, çok yaşlı kimse	vieillard,e	very old person
kolke: çûkeke wek beraşe ye sînga wê deqdeqî ye			
kolm, korm, lak, **darîn**, hewdik, qafik	köpek yalağı	auge (pour chiens)	feeding bowl (for dogs)
kone	kurnaz	rusé	cuny

korx, cirn, conî, cunî	oyuk taştan dibek, kurna	grand mortier en bois ou en pierre	large wooden or stone mortar
kosre, kosere, berê kartîk	bir cins zimpara taşı	eméri	
kobe	kadın giysilerinin kenarlarına başka bir kumaş parçası ya da danteli dikme yoluyla yapılan işleme.		
koval	sarmal, helezonik	spiral, hélicoïdal	spiral, helicoidal

Ferhengoka **Hawarê**

(II)

Amadekar : Zinar SORAN

kurdî	**tirkî**	**fransizî**	**îngilîzî**
bandev, miştî	kar fırtınası	tempête de neige	snow storm
berpê kirin	sunmak, arz etmek	présenter	to present
berwar	yamaç	versant, flanc	slope, side (of a hill)
berweq	bir çeşit tüfek	une sorte de fusil	a kind of gun
bîşeng, şêngebî, şorebî	salkım söğüt	saule pleureur	weeping willow
bijandin	arzu etmek, iştahı çekmek	désirer, avoir envie de	to desire, to want sth.
çêlî	yavru	petit (d'un homme ou d'un animal)	young (human or animal)
daketî	ahfad, torun	descendant	descendant
fêlçakî: kiryara baş	iyi fiil	bonne action	good turn, good deed
gurmijîn	kükremek	rugir (lion)	to roar
gurmist, kulmist, kulm	yumruk	poing	fist
gizing	şafak	aube (du jour)	dawn
hingura êvarê	magrib	crépuscule	twilight, dusk
hûrbijarî	özenle	avec soin, attentivement	carefully
keşaf	izci	scout	boy scout
kundayî	işlenmiş sırmalı	brodé (de fil d'or ou d'argent)	gold or silver embroi-dered
kutefir	selva kuşu, bıldırcın	caille	quail
lêz	kul, köle	esclave	slave
lûç	hile, oyun	ruse, tricherie	trick, cheating
pêrû, bist, pêwr	Süreya yıldızı, ülker	Pléiades	the Pleiades
piştdawî	kıyamet	jour du Jugement dernier	Doomsday, Last Judgement
qerepûşî	kara puşu	voile noir	black veil
qunders, qunederz, *nf*	iğne ardı	point amère	backstitch
zûxal, zûhêl, *nf*	makas ağzı, artık, bez yada kumaş parçası		
qurç, qurt, *nf*	su yudumu	gorgée d'eau	mouthful (of water)

qurçandin, daqurtandin	yutmak	avaler	to swallow
çavqurçkirin, çavqurçandin	göz kırpma	clignenent des yeux	twinkling
çav qurçandin, çav qurç kirin	göz kırpmak	faire de l'œil, cligner de l'œil	making eyes, winking (at s.o.)
rawes	durak	arrêt	stop
reşiş, rişêşk	kısa süreli hafif yağmur	pluie fine de courte durée	
şapat	kısa süren serpinti	petite pluie de courte durée	birds nest build with stones
şapato	havaya göre yer değiştiren, fırsatçı	opportuniste	opportunist
sehgura sibê, sewgurî	alaca karanlık, fecir	entre chien et loup	at dusk, at twilight
sergevaz: rêber, mezin	lider, büyük	leader, chef	leader, chief
serheng	albay	colonel	colonel
solîn, *nf*	1) gonca, 2) çiçek tarlası, 3) taşlar-la yapılmış kuş yuvası, 4) künk	1) boufon (de fleur), 2) champs de fleurs, 3) nid d'oiseau gravé sur la pierre, 4) con-duite d'eau en terre	1) bud, rose bud, 2) field of flowers, 3) bird nest graved on stone,4) earthen-ware water pipe
stiwar	sabit, sağlam	robuste, solide	robust, solid
şemirandin	1) terk etmek, bırak-mak 2) uyuşturmak	1) abandonner, 2) engourdir	1) to give up, to aban-don, 2) to (be) numb
xew lê tewirîn	uykusu kaçmak	avoir du mal à dormir, perdre le sommeil	to be unable to sleep to loose one's sleep
totik; tutuk, qelefîsk, tondik, kundkî, qilûzk	çömelme	accroupissement	squatting, crouching
tût vedan	çömelmek	s'accroupir	to squat, to crouch down
vekît	dikte	dictée	dictation
vekîtandin	dikte etmek	dicter	to dictate
vemaltin	çevremek	retrousser les manches	to roll up one's sleeves
vemiştin, şûştin	yıkamak	laver	to wash
dest vemiştin,	el yıkamak,	s'en laver les mains,	to give up, to wash one's hands (of s.th)
dest jê şûştin	umudunu kesmek, vaz geçmek	renoncer	to give up, to wash one's hand of sth.
warkoz, alkoz	kışlak	campement d'hiver (for animals, (pour nomades)	winter quarters nomads or an army)
werşeq	vaşak	lynx	lynx
werihîn, weşîn, werîn	dökülmek, düşmek	tomber (feuille, cheveu)	to fall (hair, leaves)
xaf, haf, diyar	görünüm, görme, huzur	en vue, à la vue	in view of
çûn xafa (hafa) yekî	birini ziyarete gitmek	rendre visite à quelqu'un	to pay a visit to s.o.
xwestî	sözlü	promise	engaged to be married
zandûr	dehliz, oyuk	corridor	corridor
zemberîş, balîv, balgî	yastık	oreiller	pillow
zikmakî	fitrî, doğuştan olan	congénital	congenital

zimag, nizar, keresî	güneş görmeyen yamaç	versant ne recevant pas le soleil	sunless slope
zîvar, hejar	yoksul	indigent, pauvre	indigent, poor, needy
zomp, mirc, geran	balyoz	masse, casse-pierres	sledge hammer

KEVIRÊN BIHADAR

Amadekar: Reşo ZÎLAN

Kevirên bihadar : (î) Gem, gemstone, (t) kıymetli taşlar

Berî her tiştî pêdivî ye, ku em piçekî li ser peyva **kevir** rawestin. Ji ber ku peyva **kevir**, di zaravayê kurmancî de, di hindek devokan de bi maneya zinar e, ango tehtekî mezin û qerase ye. Di cîhê peyva **kevir** de, ew peyva **ber** bi kar tînin. Ne bi tenê di hin devokên kurmancî de, lê di zaravayên din yên kurdî de jî ji bo peyva **kevir**, peyva **ber** tête bi kar anîn. Bo nimûne: bi zazî **ber**/**bere**, bi soranî, feylî, lorî û lekî **berd**. Vêca heçî peyva **ber** e, ji bilî maneya **kevir**, di kurmancî de xwedî çend maneyên din e jî. Wek: 1.fêkî, meywe; semere, 2.nekêmber, biber, 3.pêş, 4.rû, 5.hindav, îstiqamet, 6.dên (dîtin), temaşe û hwd. Ji bo ku em ji vê tevliheviyê bi dûr kevin, me çêtir dît ku em peyva **kevir** wek forma sereke bi kar bînin.

Ji milekî din ve, mirov dikare di şûna **kevirên bihadar** de, herwekî ku di klasîka kurmancî ya Memê Alan de jî hatiye 'emilandin, **kevirên gewher** jî bibêje.

Kevirên bihadar li gor cîhên ku ew lê têne bi kar anîn, dibin 3 tof:
1. Yên ku wek xişir, xemil û xêz, têne bi kar anîn, 2. Yên ku wek derman û herweha ji bo armancên hunerî û teknîkî têne bi kar anîn, 3. Yên ku ji bo alavên navmalê, kinc, mobîlya, tablo, xemil û dekorasyonên mîmarî têne bi kar .

Ji bilî vê, ew li gor şefafbûna xwe jî dibin çend tof:
1. Tamşefaf, 2. Nîvşefaf, 3. Neşefaf

Kevirên bihadar ji aliyê hişkbûna xwe ve jî dibin 3 tof:
1. Hişk, 2. Nîvhişk, 3. Nerm

Di sîstema senifandina kevir bihadar de, nirx û bihayê kevirên zînetê, li gor hişkbûn, taybetmendiyên optîkî û herweha li gor peydabûna wan têtê tesbît kirin. Gewher yan jî kevirên bihadar ji kevirên zînetê yên dereceya 1, 2 û 3yan, lê kevir nîvçebihadar jî, ji kevirên zînetê yên dereceya 4 û 5an têne hesêb. Ev yeka han jî bûye sedema ku ew di sê tofan de bêne bi nav kirin:
1. Kevirên bihadar, 2. Kevirên nîvçebihadar, 3. Kevirên xemlê

Lê zanista nûjen ya kevirên bihadar bi vê senifandinê ne qayîl e. Ew hemû mîneral û kevirên ku ji bo xemlûrêzê têne bi kar anîn, wek kevirên bihadar bi nav dike. Ji lewra jî wê dike 2 tof:
1. Kevirên bihadar yên mîneral
Ku ev jî ji van koman pêk têt: 1. Element, 2. Sulfîd, 3. Halojenîd, 4. Oksîd, 5. Karbonat, 6. Sulfat, 7. Fosfat, 8. Sîlîkat, 9. Terkîbên organîk.
2. Kevirên bihadar yên ne mîneral.

kurdî	**tirkî**	**fransizî**	**îngilîzî**
almas (=elmas, almast) (yûnanî : adamas)	elmas	diamant	diamond
almasa reş	kara elmas	diamant noir	black diamond
almasa traşkirî	yontulmuş elmas	diamant taillé	cut diamond
almasa sertîrkî (=almasa peykanî)	okucu biçiminde yontulmuş elmas	diamant taillé en forme de flèches	a kind of dimonds in the shape of arrow-heads
almasa xaldar (=almasa bixal)	benekli elmas	diamant tacheté	a diamond with ablack or red mark (worthless)
almasa şîrîn (=elmasa nebatî)			a kind of diamond
almasa xam	işlenmemiş elmas	diamant brut	unpolished diamond

korûnd: (sanskrîtî kuruvinda)	korindon	coridon	corundum
yaqût (=aqût) (yûnanî: yakothos)	yakut	rubis	ruby
yaqûta şîn	gök yakut, safir	saphir	blue gem, saphire
yaqûta zer	sarı yakut	topaze	yellow gem, topaz
yaqûta mor (=yaqûta binevşî)	mor yakut	améthyste	amethyst
yaqûta le'l	lâ'l yakut, grena	grenat	garnet
yaqûta sor	kırmızı yakut	rubis	red gem, ruby
yaqûta Îskenderî	İskender yakutu	rubis d'Alexandre	precious stones gathered by Alexander's compa-nions when retuning from the regions of darkness
yaqûta hinarî	nar regi yakut	rubis couleur grenade	pidgeon blood ruby
yaqûta seyyal	seyyal yakut	rubis de première eau	ruby of fine water
yaqûta nerm	yumuşak yakut		poorer kind of precious stone
yaqûta kesk	yeşil yakut	saphire vert	green saphire
yaqûta pembe	pembe yakut	rubis rose	pink ruby
yaqûta erxewanî [padparadscha] : (sanskrîtî)	erguvan regi yakut	rubis pourpre	purple ruby
yaqûta porteqalî	turuncu yakut	saphire orange	orange saphire
yaqûta spî	beyaz yakut	saphire blanc	leukos saphire
yaqûta xam	işlenmemiş yakut	rubis brut	unpolished ruby
le'l	lâ'l	rubis, grenat	ruby
le'la abdar (=le'la xoşav)	lâ'l-ı hoşab	rubis de 1ère eau	a most brilliant ruby
le'la pîvazî		rubis rouge et blanc	a kind of red and white ruby
le'la sertîrkî	ok ucu şeklinde oyutulmuş yakut	rubis forme de tête de fléche porté en boucle d'oreille	a ruby of the shape of an arrow-head worn as an eaning
le'la doşabî (=le'la doşavî)	şurup renkli yakut	rubis couleur de syrop	a syrup - coloured ruby
le'la rehdar	kusurlu yakut	rubis ayant un défaut	a ruby with a flaw or defect
le'la nab	lal-ı nab	rubis lustré	lustrous ruby
le'la qulnekirî (=le'la kunnekirî/nesimtî)	delinmemiş yakut	rubis non percé	undrilled ruby
le'la yaqût	la'l yakut	grenat	garnet, carbuncle
lûlû (lû'lû')	inci	perle	a pearl
lûlûya meknûn	kabuğunda saklı inci	perle caché dans sa coquille	a pearl concealed in its shell
lûlûya munezzed	seçkin inci	perle en vue, espacée	pearls neatly strung
lûlûya şehwer	şahane inci	perle royale, très précieuse	a pearl worthy of a king, very precious pearl

durr	inci	perle	pearl
durra ‘Edenî	Aden incisi	perle d’Aden	pearl of Aden
durra giranmaye	büyük ve değerli inci	perle précieuse	precious and big pearl
durra xoşav	şefaf inci	perle de belle eau	fine pearl
durra menzûm	düzenli inci	perle régulière	strung pearls
durra meknûn	kabuğunda saklı inci	perle caché dans sa coquille	hidden pearl in its shell
durra nab	parlak beyaz inci	perle blanche brillante	shining white pearl
durra qulnekirî (=durra hunnekirî/nesimtî)	bakire inci	perle vierge, non percée	virgin pearl, unbored pearl
durra nefîd	inci dizisi	rangée de perles	a string of pearls
durra sedefnîşîn	sedefte saklı inci	perle lovée dans le nacre	a pearl which is still in its mother of pearl
durra semîn	iri ve değerli inci	grosse perle pressieuse	precious pearl
durra sîrab	iri inci	grosse perle	large pearl
durra şehdane	çok iri inci	très grosse perle	very large pearl
durra şehwer	şahane inci	perle royale, magnifique	magnificent pearl
durra yêgane	eşsiz inci	perle sans pareille	a matchless pearl
durra yekdane	ender inci	perle rare	rare pearl
durra yekta	ender ve değerli inci	perle rare et très précieuse	rare pearl, pearl of great price
durra yêtîm	öksüz inci	perle solitaire, rare	rare pearl
pîroze (=pîrozank)	firuze, türkuvaz	turqoise	turquoise
mircan (=mercan)	mercan	corail	coral
mircana reş	siyah mercan	corail noir ou mort	black coral
sedef	sedef	nacre	mother-of-pearl
mirarî (=merwarî, megrît)	inci	perle	pearl
zimrûd	zümrüt	émeraude	emerald
‘eqîq (=heqîq)	akik	agate	agate, carnelian
‘eqîqa Yêmenî	akik-ı Yemeni	agate du Yémen	carnelian from Yemen
topaz: (sanskrîtî: tapas)	topaz	topaze	topaz
topaza spî, şîn, zer, porteqalî, qehweyî, kesk, pembe	betyaz, mavi,sarı, turuncu, kahve, yeşil, pembe topaz	topaze, blanc, bleu, jaune, orange, maron, vert, roze	
zergûn: (farisî: zerdgoon)	zirkon	zircon	zircon
kehrîbar (=karîban)	kehribar	ambre	amber, yellow

kehrîban, kahreban, karban)			amber
kevirê Oltîyê =berê Oltîyê, kevirê Erzeromê, kehrîbara reş	siyah kehribar, kara amber, Erzurum taşı, Oltu taşı)	ambre noir	amber black
kevirê Silêmanî	damarlı akik	onyx	onyx
kevirê lûle	Eskişehir taşı, lüle taşı	meerschaum	
qîlê fîlan (=kêlbeyê fîlan)	fildişi	ivoire	ivory
billûr (=krîstal, belor, belûr)	kristal	cristal	crystal
berzîvk (Kevirekî reş î wek yê Oltîyê ye)			
metalên bihadar	kıymetli metaller	métaux précieux	precious metals
zêr	altın	or	gold
zêrê zer	sarı altın	or jaune	yellow gold
zêrê spî	beyaz altın	or blanc	white gold
zîv	gümüş	argent	silver
platîn	platin	platine	platinum

Çend peyvên ku bi pêşekariya kevirên gewher ve peywendîdar in :

almastraş (= elmastraş)	elmas yontucusu	diamantaire	diamond cutter
traştin, traş kirin (=daterişîn)	yontmak	tailler	to cut
traştin, traşkirin (=daterişandin)	yontma, yontmak	taille	cutting
li ser şuxilîn, li ser kar kirin	işlemek	incruster	to encrust, to inlay
liserşuxilîn, liserkarkirin	işleme	incrustation	inlaying
’eyar, ’iyar	ayar	carat	carat
zîvker	gümüşçü; gümüş işleyen	orfèvre, spéci-aliste d’argenterie	silversmith
zîvkerî	gümüşçülük; gümüş işlemeciliği	argenterie	silverware
zîvfiroş	gümüşçü, gümüş satan	marchand d’ob-jets en argent	silver jewelry merchant
zêrker	kuyumcu; altın işleyen	orfèvre en bijoux d’or	goldsmith gold jewelry
zêrkerî	kuyumculuk; altın işlemeciliği	orfèverie de bijoux d’or	gold ware gold jewelry
zêrfiroş	kuyumcu, altın satan	marchand de bijoux d’or	gold jewelery merchant